

## Feydeya nivîsandinê çi ye?

Çima em dinivîsin? Nivîsandin çawa dikare vê rastiya trajîk ku tê de jin berdêlên giran didin biguhere, di demekê de ku zordariya olî bi zordariya siyasî re têkel e?

dom»R:9




*Bidesîveanîna mafên netewî yên gelê kurd*
*di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*
*www.agirimedia.org Hejmar (481) 05-11-2024 Buha (1000) Tûmen*



## Rêberê bêber-pirsiyarî!!

Elî Xamineyî di heyama zêdetir ji 35 salên desthilatdariya xwe de weke rêberê Komara Îslamî ya Îranê, her dema ku biryar zehmet be yan jî berpirsatî hebe û erkê bi berpirsên din re veqetîne, destê xwe li berpirsiyarariyê şuştiye. Piştî êrîşa Îsraîlê ya li ser Îranê gelek kes meraq dikirin gelo dê Îran bersiva êrîşa Îsraîlê bide yan na........

dom» R:3



## Meydana fînalê

Dîplomasî li encama şer û hevrikiya hêzan de tê pêş, li rastiyê de diplomasî encama şerek li navebra du an çend aliyan de diqewime û bi wateyeke naskirî ya dîplomasiyê jî, berdewamiya şerê fîzîkî li meydana siyasî û danûstandinê ye.Bi vê wateyê, li navbera du an çend aliyande alozî û hevrikî dîqewime û ew hevrikiya bo .......

dom» R:2

# Peyama pîrozbahiya Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokrat bi hilkefta birêveçona hilbijartinên Parlemana Herêma Kurdistanê

**Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, bi hilkefta birêveçona hilbijartinên Parlemana Kurdistanê, Peyameke pîrozbahiyê belav kir.**

**Deqa peyamê wiha ye:**




Roja Yekşemî 29ê Rezberê, (20ê October 2024), şeşemîn dora hilbijartinên Parlemana Herêma Kurdistana Îraqê li rewşeke azad û dêmokratîk de bi rê ve ço.

Birêveçona vê hilbijartinê bi beşdariya çendîn Hizb, aliyên siyasî, berbijêrên serbixwe û bi çavdêriya dehan damezraveyên mediayî û rêkxiravên Kurdistanî, Îraqî û navnetewî, ew jî li devera tejî pirsgirêk a Rojhilata Navîn, xaleke girîng û cihê keyfxweşiyê ye.

Girîngî û erênîbûna vê proseyê li vê yekê de ye ku hewldanên li pêxema cihgîrkirina dêmokrasî li Herêma Kurdistanê, pitir li geşekirinê de ne û xelk li diyarîkirina çarenivîsa xwe de azad e û beşdariyê dikin.

Ew yek jî li halekê de ye ku li hinek ji welatên deverê, bi taybet li Îranê de ne hilbijartin taybetmendî û binyatên dêmokrasiyê tê de têne bidestveanîn û ne rê bi beşdariya azadaneya hizb û aliyên siyasî tê dan û ne xelk li diyarîkirina çarenivîsa xwe de azad in.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, bi hilkeftya birêveçon a hilbijartina Parlemana Herêma Kurdistanê, pîrozbahî li xelkê Kurdistanê, hizb û aliyên siyasî yên beşdar li hilbijartinan de dike û hivî dike ku bi hewlên hemû aliyan û bi pêkanîna hikûmeteke bersivder li asta çavnihêriyan, rewşa jiyan û mafên xelkê Herêma Kurdistanê, roj bi roj baştir bibe û Herêma Kurdistanê bibe mînakek serkevtî ji desthilatdarî û birêvebirina welat li deverê de.

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

**Navenda Birêveberiya Giştî**

**23 October 2024**



## Xuyaye ev hevîr wê gellek av bigire…

dom» R:8



## Daviya dijminayetiyek 45 salî?

dom» R:4

# Meydana fînalê



N. Kerîm Perwîzî
W. Bêhzad Simko

Dîplomasî li encama şer û hevrikiya hêzan de tê pêş, li rastiyê de diplomasî encama şerek li navebra du an çend aliyan de diqewime û bi wateyeke naskirî ya dîplomasiyê jî, berdewamiya şerê fîzîkî li meydana siyasî û danûstandinê ye.

Bi vê wateyê, li navbera du an çend aliyande alozî û hevrikî dîqewime û ew hevrikiya bo rêyeke tengav a jinavçonê radikêşe û li vê tengaviyê de navbendçî peyda dibin û bo vê ku şer heta jinavçona aliyekê berdewam nebe, deriyek vedibe ku her du an çend aliyên hevrikiyê, jui vê derbas dibin û şerê fîzîkî bo meyda danûstandinê vebiguhazin û bi rêya danûstandin û siyasetkirinê, vî şerî bidomînin.

Ew şerê siyasî û dîplomasiyê heta demekê dirêj dibe ku du an çend aliyên vê hevrikiyê, bigihîjne qonaxa jihevtêgihîştinê ku her yek ji wan çi destkevtek hebin.

Li rastiyê de encam û doma dîplomasiyê jî lihevkirinê li xwe digre, ku li vê lihevkirinê de hemû aliyan poenan didin û poenan verdigrin û tê de berjewendî bi dest dixin û rastî xisarê jî tên! Îja ron û xuya ye ku li vê lihevkirinê de aliyê bêhêz xisara zêdetir û berjewendiya kêmtir li ber dikeve û aliyê bi hêz, berjewendiya zêdetir û xisra kêmtir li ber dikeve!

Lê gelek caran tê pêş ku lihevkirin, ya dawî bo bdawîanîûn bi rewşa pevdanê nîne û li rastiyê de lihevkirineke demkî bo paşxistina hevrikiyê ye ku her du alî bi destxwe ve tînin ku bo hevrikiyeke din xwe amade bikin! Ew cure lihevkirin li hundirê xwe de bombeke demjimêrvekirî heye ku her çirçeyekê li roja qiyameta teqîna xwe nêzîk dibe û li vê rojê de diteqe, aliyên hevrikiyê diçne nav meydana fînal bo şerê dawî ku li wir de êdî berjewendî û xisarên giran têne diyarîkirin û lihevkirineke wiha liu pey xdwe tîne ku berjewendî û xalên statejiyên xwe têde nûjen dikin û bo heyameke dûrtir, aramî bi ser rewşê de cihgîr dibe.



Yek ji wan lihevkirinên demkî, lihevkirina Bercamê li navbera welî feqîh û welatên Rojavayî bû ku têde weliyê feqîh bi xisarên gelek giran, demdirêjiya temenê rêjîmê bi dest xwe ve anî bû, lê bomba demjimêrvekirî li dema xwe de bi destê Donald Trump ê Serkomarê Amerîkayê hate aktîvkirin û hevrikî ji nû ve dest pêkir!

Hevrikiyek ku li berdewamiya xwe de û bi siyaseta lawaz a "Joe Biden" ê Serkomarê din ê Amerîkayê, 7ê October a 2023yê li pey xwe anî û meydana şer berfirehtir û rontir kir.

Li wan rojan de Elî Xamineyî û kesên ser bi wî, piştî hevrikiya piştî bersivdana Îsraîl bi çerxwazî û fitneyên wan ku bi 180 mûşekên balistîkî êrîş kiribûne ser axa Îsraîl, li destpêkê de xwestin bersivdana Îsraîlê bi biçûk bidin xuya ku bi awayekê xwe ji bersivdanê veqelêzin, çimkî rewşa rêjîmê bi xwe li niha de bi baş nizanin û nigerê vê ne ku niha amadeyê vê nînin ku pê bawêjne nav meydana qedersaz li meydana fînalê û dixwestin bi şêwazekê, hêcetek bo destragiurtênê peyda bikin!

Lê derkevt ku Îsraîl derbeke wiha giran bi rêjîma Îranê daye ku ti rêyek bo înkarkirin û xwejêveqelizînê nehiştiye û her rojê, raporteke nû li derheq aqt û qasa karlêkerî ya bersivdana Îsraîl û jinavbirina binkeyên startejîk ên leşkerî ya weliyê feqîh li navxwyê Îranê de belav dibin.

Belavbûna wan raporan û xuyakirina rastiyên derba giran a Îsraîl, hem lawaziya leşkerî ya Xamineyî û spaha pasdaran a terorîst da xuya û hem li nav girûpên destçêkiriyên vê rêjîmê de li deverê, hitbara vê birê jêr birsyarê, lewma Xamineyî û tîma gêja wî biryar dane ku dê bersivê bidin!

Li şerê leşkerî li navbera rêjîma îslamiya Îranê û Îsraîlê de xalên bihêz û bêhêz ên her du aliyan hatine xuya.

Hêza leşkeriya Îsraîl bi taybet hêza esmanî bi qasek bi hêz û xwedî bandor e ku bi hêsanî hate esmanî Îranê û binkeyên stratejîk û girîng ên spaha pasdaran û hêza leşkerî kawil kirin û zivirîn û hêza Îranê nekarîn heta rêgiriyekê jî ji wan bikin!

Li hember de Îsraîl welatek biçûk e û li ber êrîşa sedan û çend hezaran mûşekî û dironî renge lawaz bê xuya!

Lewma li ragihandinan de bas ji vê tê kirin ku weliyê feqîh biryara bersivdanê daye û pisporan gotine ku vê carê, rêjîma Têhranê dixwaze mûşek û dironan bo axa Îraqê veguhaze û ji Îraqê ve êrîşê bike ser Îsraîl. Renge bernameya vê cara rêjîmê ev be ku bi vê yekê bikare derbê li Îsraîlê bide û her wek du carên pêştir abûra wan neçe û wek şanoyek neyê xuya, dixwaze êrîş berfireh û ji çend aliyan ve bi mûşekên kirûz, balistîkî û dironan êrîşê bike ser axa Îsraîl, hekî êrîş berfireh û çend alî nebe, sîstema berevaniya îsraîl dê bersivê bide û dubare dê bi şanoyek dê bê berçav, hekî êrîş berfireh be êdî nayê kontrolkirin û xuya nake ku dê bi çi qasekê xisra mirovî bi Îsraîlê bikeve ku ev yek bi xwe jî dê bibe sedema bersivdaneke tundtir a Îsraîlê û renge rêjîmê bêhêz bike!

Bo derbasbûn ji vê bêhêziyê, her ji 7ê October a 2023 ve û pêştir jî li hizra berfirehtirkiri9na lezgîn a bernamjeya navkiya xwe bû û li 7ê Octoberê ve bi mifahvergirtin ji kîşana bala civaka cîhanî bo şerê Îsraîl û Hemasê, rêjîmê meyandina Uraniyomê lezgîntirv kir û xwe nêzî berhemanîna çeka navkî kiriye.

Her li niha de hem fermandeyên spaha pasdaran a terorîst bas ji vê dikin ku renge bo aliyê bidestveanîna çeka din ku armanc çeka navkî ve herin û hem şêwirkarê Xamnineyî, anku Xerrazî ragihyandiye ku şiyana berhemanîna çeka navkî hene û serê mar bi xwe jî ragihyandiye ku bo dijayetî digel dujmin, her çekek hewce be, dê bi dest xwe ve bînin!

Wa xuya dike ku rêjîm dixwaze bo parastina xwe ji êrîşa gurcikbira Îsraîl û tirsandina Îsraîl û Amerîkayê ku êrîşkirinê negihînin qonaxekê ku rêjîma Îranê bêhêz bibe, geva vê dixwin ku dê listokê bibin asteke din!

Eva ku tirs û gefxwarina vê bike ku renge lîstokê bibe asteke din ku aliyê beranberê te xisarên gelek zêde pêdikevin û li rastiyê de gefa têkdana çarçoveya lîstokê dike, renge bi awayek bibe bandor ku aliyê beranber bêxe hizra vê yekê ku bo têkçona yekcarî ya rewşê, hêj bersivdaneke dijwar nede.

Lê renge vê peyamê jî bide aliyê beranber ku hekî derfetê pê bêdanê, li wî warî de bihêztir dibe û renge rojekê bi nişkêve vê gefxwarinê bike praktîk, îca baştir ev e ku niha ku rewş li wî warî de baş e û hêz kom bûye, bomba demijimêrvekirî bi rê bixin û listokê bibin meydana fînalê û êdî hevrikiya dûr û dirêj a çend dehikan bi dawî bê û lîstoka fînalê bê lîstin û derba gurcikbir bê lêdan û renge li nav hundirê bûyerên vê de dûredîmena paşerojê bê xuya.

Îro jî nebe, li paşerojeke ne-dûr de weliyê Feqîh û kesên ser bi wî, dê bibin bo meydana fînalê, encama fînalê jî renge pêşbînîkirî nebe, lê lojîka hêz dibêje ku li vê hevrikiyê de kê xisara mezintir ber dikeve û her lojîka hêzê jî dibêje li li vê lîstoka fînalê, de çi bi me kurdên Rojhilat bikeve û dê çi ber me bikeve.

# Rêberê bêberpirsiyarî!!



Dr. Mecid Heqî



Elî Xamineyî di heyama zêdetir ji 35 salên desthilatdariya xwe de weke rêberê Komara Îslamî ya Îranê, her dema ku biryar zehmet be yan jî berpirsatî hebe û erkê bi berpirsên din re veqetîne, destê xwe li berpirsiyarariyê şuştiye.

Piştî êrîşa Îsraîlê ya li ser Îranê gelek kes meraq dikirin gelo dê Îran bersiva êrîşa Îsraîlê bide yan na.

Xamineyî gelek caran gefa tolhildanê xwariye û bajarên Tel Avîv û Îsraîlî bi erdê re xwariye.

Piştî êrîşa roja Şemiyê 26 Cotmeha 2024 ya ser binkeyeke leşkerî û berevaniya esmanî ya Îranê, rejîma Îranê hewl da ku bûyerê kêm bike, da ku bersivê nede.

Bêdengiya destpêkê ya fermandarên pasdarên Şoreşê û rayedarên rejîmê, bi taybetî daxuyaniya Wezareta Derve ya Îranê piştî êrîşê, vê yekê xurtir kir ku dibe ku Îran niyet neke bersiva êrîşa Îsraîlê bide û şerê Îran û Îsraîlê bi aqilane kontrol bike.

Lê gotinên Xamineyî yên roja din atmosfereke gumanê di nav rayedarên rejîmê de çêkir.

Xamineyî bi eşkere behsa tolhildana li dijî Îsraîlê nekir.

Li şûna wê, top avêt qada Lijneya Ewlekariya Bilind û dewletê biryar spartin wan.

Eger Konseya Bilind a Ewlehiya Neteweyî ya Îranê û dewlet biryara bersivdayîna Îsraîlê bidin, Îran wê bi Îsraîl û Amerîkayê re şer bike.

Xamineyî dê di pêşerojê de xwe ji berpirsiyariyê dûr bixe û got, ev biryara desthilatdariyê ye û ti rola wî tune ye.

Ger biryar neyê dayîn, Xamineyî ji alîgirên xwe yên tundrew re dibêje ku ew ne dewlet e ku biryarê dide, wekî din ew amade ye ji bo têkbirina Îsraîlê şer bike.

Xamineyî her tim di demên dijwar de karbidestan sûcdar dike û xwe ji xeletî û berpirsiyariyan dûr dixe.



Ti carî bêyî destûra wî biryar û berpirsiyarî nayên dayîn û nayên cîbicîkirin.

**Rêberê Komara Îslamî di hemû warên kar û barên dewletê de destêwerdanê dike û berpirsiyariyê qebûl nake.**

Li gorî destûra bingehîn a Îranê, berpirsyariya ragihandina şer û aştiyê li gel welatekî din, dikeve stûyê rêberê xwe de, lê Xamineyî hewl daye ku ji her du aliyan re cihekê ji xwe re çêbike ku ji berpirsyariyê birevin.

Xamineyî beriya niha jî çalakiyên bi vî rengî nîşan dabûn.

Di sala 2018'an de jî, piştî xwepêşandanên li ser bilindbûna nirxê benzînê ya ji nişka ve ku zêdeyî 1500 xwepêşanderan jiyana xwe ji dest dan, parêzbendiya xwe ragihandibû.

Dema ku Donald Trump biryar da ku Dewletên Yekbûyî ji Peymana Bazirganiyê vekişîne, wî heman tevger nîşan da.

Xamineyî got ku ew di destpêkê de li dijî peymanê bû lê ku "rayedaran" guh neda hişyariyên wî.

Her kes dizane ku bêyî destûra Xamineyî tu biryar nayê dayîn û bêyî erêkirina wî tu peyman nayê îmzekirin.

Beriya destpêkirina hikûmeta Rohanî di serdema Ehmedînejad de, danûstandinên Bazirganiyê bi awayekî veşartî li ser biryara Xamineyî dest pê kirin, piştre Hesen Rohanî û Mihemed Cewad Zerîf bi destûra wî bi Amerîkayê re hevdîtin pêk anîn û di hemû qonaxên hevdîtinê de ji Xamineyî re ragihandin.

Nimûneyên jorîn nîşan didin ku çawa Xamineyî di demên hestiyar û biryarên dijwar de ku dibe ku piştre ji çavê rejîmê bi ser nekevin û karibe berpirsên xwe mehkûm bike û xwe wek alîgirê mafên gel nîşan bide, xwe ji berpirsyartiyê digre.

**Piştî êrîşa Îsraîlê ya 26ê Cotmehê ya li ser Îranê, Xamineyî bi hêza nifûza Îsraîlê hesiya û biryara "tolhildanê" spart Encumena Bilind a Asayişa Netewî ku hemû endamên wê ji aliyê Xamineyî bi xwe ve hatine destnîşankirin.**

Ji ber vê yekê, di dawiyê de li ser wî ye ku biryarê bide ku êrîşî Îsraîlê bike yan na, lê bi vî awayî Xamineyî dixwaze xwe ji berpirsyariya encamên wê biryarê dûr bixe.

# Daviya dijminayetiyek 45 salî?



N. Elî Munezemî



Di wê gotarê de armanc ewe ku nakokiya Îran û Îsraîl li gor perspektîfa realîzma nûjen were şirove kirin û bal bê kişandin li ser berjewendî, ewlehî, hevsengiya hêz û lîstika hêzê ya Îran û Îsraîlê di pêkhateya anarşîk ya navneteweyî de.

Li gor dîtinek realîstî, cîhan tijîye li alozî û nakokîyên navbera dewletên ku hewl didin ewlekarî û hêza xwe biparêzin an bihêz bikin û bo baştir têgihîştin li wê yekê, Îran û Îsraîl mînakek baş in.

**Ewlehiya hêz û serdestiya herêmê**

Di realîzma nûjen de her du dewlet jî wekî aktorên stratejîk ên ku di serî de ewlekarî û pozîsyona xwe ya li Rojhilata Navîn eleqedar in, têne fêm kirin.

Îsraîl Îrana ku xwedî hêza nuklerî ye wek metirsiyek mezin li ser hebûna xwe dibîne û gelek caran amadebûna xwe nîşan daye ku rê li ber Îranê bigire ku çekên nuklerî çêbike - pir caran bi çêkirina guvaşê bo danîna cezayên aborî li ser Îranê, zexta dîplomatîk û yan wek tê îdiakirin, bi sabotajê li dijî zana û fabrîqeyên Îranê astengî bo Îranê çêkirine.

Îran ji aliyê xwe ve hewl dide xwe li hember fişarên Îsraîl û hevalbendên wê (bi taybetî Amerîka) sîgorte bike û ber hindê jî bernameya xwe ya navokî hem wek rêgir û hem jî wek amûrek ji bo parastina xwe li hember gefên derve dibîne.

**Hevbendî û şerê wekalet**

Her du welatên Îran û Îsraîlê jî îtîfaqên xurt ava kirine û piştgirîyê didin aktorên cuda yên ne-dewletî yên li herêmê wekî rêyek ji bo pêşvebirina berjewendîyên xwe û ewê yekê wek stratejiyek klasîk a hêzê di nav realîzmê de cîbecî dikin. Îran piştgiriya komên wek Hizbullahê li Lubnanê û milîsên cuda cuda li Sûriye û Iraqê dike da ku bandora xwe zêde bike û “kevaneke berxwedanê” li dijî Îsraîlê pêk bîne.

Îsraîl ji aliyê xwe ve, bi welatên weke Erebistana Siûdî û Îmarat re di hevpeymaniyeke nefermî de li dijî ajandeya berfirehxwaziya Îranê kar dike, ku ev yek jî weke hewlek ji bo parastina hevsengiya hêzan tê dîtin.

**Pirsgirêka ewlehiyê û mîlîtarîzekirinê**

Xala sereke di realîzmê de pirsgirêka ewlehiyê ye.

Bi wê wateyê ku hewildana dewletek ji bo bihêzkirina ewlehiya xwe, ji hêla dewletek din ve wekî xetereyek tê hesibandin, ku dibe sedema spiralek ji nû ve ya çekdarî. Pêşdebirina leşkerî ya Îranê û avakirina bernameyên mûşekî, herwiha şiyanên leşkerî yên Îsraîlê û nûjenkirina sîstemên berevaniya esmanî yên wekî Gunbeda hesinîn û sîstema dijî hajekî a TAD, vê yekê bi başî nîşan dide. Dema ku yek ji wan xwe ji gefên aliyê din re amade dike, ev yek dînamîkek xwehêzdarkirinê diafirîne ku tê de hewla her dewletekê ji bo zêdekirina ewlehiya xwe, têgihîştina ewlehiyê ya dewleta din têk dide.

**Amerîka, Rûsya û Çîn- lîstika welatên zilhêz**

Di realîzma modern de faktoreke din a girîng bandora welatên zilhêz e. Dewletên Yekbûyî yên Amrîka di piştgirîkirina Îsraîlê de rolek girîng heye.Her di heman demê de, Îran ji bo rûbirûbûna serdestiya Amerîkî, ji Rûsya û Çînê piştgirî verdigre. Ev yek dîmenek giştî ya cîhanî di pevçûnan de dide ber çavan.

Her du dewletên Îran û Îsraîlê, di xerîteya mezin a şerê welatên zilhêz de ku di navbera Dewletên Yekbûyî yên Amrîka û hevalbendên wê ji aliyekî û Rûsya û Çinaîn ji hêla din ve, wekî piyon tevdigerin û rola xwe dibînin.

Ev lîstika welatên zilhêz arîkariya dirêjkirin û xurtkirina pevçûnên navbera Îran û Îsraîlê dike, ji ber ku her du alî piştgirîyê verdigirin da ku dijberiya hevûdu bidomînin.

**Aktorên rasyonel û berjewendiya xwe**

Ji perspektîfa realîzma nûtir, her du dewlet wekî aktorên rasyonel têne hesibandin ku li gorî berjewendîyên xwe tevdigerin, ne li gorî prensîbên îdeolojîk. Her çiqas retorîk bi gelemperî li ser nakokiyên olî û exlaqî be jî, realîzm vê yekê wekî aliyekî duyemîn dibîne.

Pevçûn di bingeh de ji hêla hewcedariyên stratejîk ên kontrol, bandor û ewlehiyê ve tê rêve kirin - ku her du alî hewl didin ku pozîsyonên xwe di pergala anarşîk ya navneteweyî de bilindtir bikin.

**Encam**

Li ser wê bingehê, realîzm nakokiya Îsraîl-Îranê wekî lîstikek hêzê ya domdar dibîne ku her du alî hewl didin hevsengî, ewlekarî û bandora xwe zêdetir bikin di herêmekê de ku destwerdana derve ya welatnên zilhêz bi gelemperî nakokî girantir dike. Ewa ku niha rewş li dema berê jî aloztir kiriye, hêrişa raste rast a Îran û Îslaîlê e li ser hev.

Bi xasma niha ku Îranê di hêlekê de derbeyek mezin li aliyê Îsraîlê ve pêketiye û balans û hevsengiya hêzê lawaz kiriye, û li hêla din ve jî li aliyê zilhêzên wek Rûsya û Çînê ve bi wî awayî ku Amrîka piştgiriya Îsraîlê kiriye, nehatiye piştgirî kirin, Îran ketiye ser durêyaniyek dijvar.

Eger Îran nekare bersiva Îsaîlê bide, yê bo demek dirêj bandora xwe li Rojhilata Navîn de winda ke û eger bersiv jî bide, îmkan heye wê carê tûşî derbeyên hêşta girantir were û rêjîm û Îran biçin bo aliyê nemanê ve.



# Demokrasîxwaziya ne demokratîk û bandora vê li ser tevgerên azadîxwaz



Serbest Urmiye



Bervajî kirina pêvajoya demokrasiyê wate serhildana demokrasiya paşvero, meşek e ku civak û sîstemên desthilatdarî û heta pêkhateya hêzên demokrasîxwaz jî gav bi gav ji prensîpên demokratîk dûr dixe û bi sînordarkirina azadiyê divarên cuda de civaka sivîl, difetisîne.

Demokraiya paşvero him di sîstemên hikûmetî de tê dîtin û him jî dikare di navbera hêzên demokrasîxwaz de jî serhilbide.

Lê ya ku herî bi bandor e li ser pêvajoya demokrasîxwaziyê, serhildana vê demokrasiyê ye di navbera hêz û aliyên demokrasîxwaz de ku dibe asteng li ser riya azadyê û berdewam mayîn û hêza serkutkirinê di rejîmên dîktator de pêşve dibe.

Pêvajoya bervajîkirina demokrasiyê di rejîmên diktator de bi yasayîkirina sîstemê û di rêya guhertina yasayên hilbijartinê, sînordarkirina azadiyê di her aliyekê de û kontirolkirina dezgehên ragihandinê û çavkaniyên saman û dahata giştî de ye û di bin siya "demokrasiya paşvero" de, rejîmên diktator derfetê peyda dikin ku beşdariya rastîn a welatiyan di piroseyên demokratîk de veşêrin û azadî û serxwebûnê di biriyar danê de ji welatiyan bistînin.

Ev di sîstema xwe de saziyên dewletdariyê û partiyên siyasî û navendên civaka medenî di rûmetê demokratîk de ava dikin û bi rêkxistina hilbijratinên bi nav demokratîk, hewil didin meşrûiyeta navneteweyî wergirin û raya giştî ya navxweyî kontrol bikin.

Ji bilî fetisandina civaka sivîl, rejîmên dîktator ji wî terzî ji demokrasiyê ji bo bê bandor kirina hêzên opozîsiyonê anku dijberên xwe yên siyasî jî mifahê werdigirin.

Her weke hatiye gotin bervajîkirina demokrasiyê xêncî sîstemên desthilatdariyê, dikare di navbera hêzên azadîxwaz de jî ser hilde, nemaze di welatên pir netewe de ku tevgera azadîxwaziyê hewceyî hevalbendî û pêkhatina eniyeke bihêz e li dijî sîstema dîktaror a desthilatdar.

Di vî alî de, cudahî û pir rengî di navbera çanda civakî û civakên siyasî yên cuda de, dibin heger ku komek ji daxwazî û xwestekan bi rûmet di şekl û formên demokratîk de derdikevin, lê di bingeh de ev dijberên sereke û astengên asê ne ku dikevin ser rêya pêşveçûna pêvajoya demokrasî û azadîxwaziyê.

Weke mînak mirov dikare daxwazî formên binpêkirina demokrasiyê di navbera hêzên opozîsiyonê yên dijberî rejîma Îranê û bi xasmanî opozîsiona tewahîxwaz a navenda Îranê ku bûne asteng li hember şoreşa"Jin, Jiyan, zadî"yê wiha şirove bike.

Ji bilî tepeserkirina partî û aliyên siyasî û xurtkirina zexta hêzên ewlekarî û leşkiri, di şoreşa "Jîna"yê de ji aliyê rejîmê ve pêşkeşkirina çend formên bi rûmet demokrat ji aliyê opozîsiyona ne hevgirtî ya navenda Îranê de bi awayekî xesaret li şoreşê dan tenê xwîn ji ber here.

Di nava hêzen opozîsiyonê yên netewexwazên Faris di navenda Îranê de, ji bilî nebûna sitratejiyeke tev alî ya di siyaset û xebatê de, dijberî tevî hebûna neteweyên din di formên serbixw yên neteweyî, çandî de û hewil dan bo fetisandina dengê wan di hindur sîstemeke navendî ya yek netewe û yek welat de, sedemeke mezin di pêknehatina eniya azadîxwaziyê li hember rejîma Îslamî ya serkutkar de bû.

Wan ji tirs yan bi piropagendeya perçebûna Îranê, deriyê gotobêjê li ser gotarên siyasî û azadîxwaz yên pêkhateyên neteweyî yên neteweyên xêncî Faris de daxist û ji ber nebûna gotareke tev alî ji demokrasiyê li gor eslên navneteweyî yên demokrat û mafên mirovan bo Îrana piştî desthilata Îslamî, di çarçoveya demokrasiya paşvero de hewil dan ku ne tenê reya serkevtinê asteng kirin, belku bûne sedema hevnegirtina gel jî li dijî sîstema serkutkar a hakim.

Ji bilî vê çendê dibe ku demokrasiya paşvero di pêkhateya hindurîn ya hezên siyasî û azadîxwaz de jî ser hilde.

Gihîştin bi navenda biriyardanê û kontirol kirina civata giştî ya birêveberiyê, hegera sereke ya serhildana demokrasiya paşvero ye di pêkhateya hêzeke azadîzwaz di forma partiyeke siyasî de.

Di rewşeke wiha de hemû bizavek tê dayîn ku rûmeteke demokratîk ji partiyên han were xuyakirin, lê di esil de tişteke din e.

Di pêkhateya her hêzeke siyasî de ku berpirsiyarî û nemaze çavdêrî û rastbêjî di navenda biriyarê de lawaz bû, endamên civata biriyardanê, hewil didin ku bi ser pêkhateya giştî de zal bibin û hêza biriyardanê di navendeke dilxwaz de kom bikin û piranî rêya gazinde û bihîstina dengê endman û piştre dengê civakê, girê didin.

Di rewşeke wiha de hewildan bo gihîştin bi navenda biriyardanê û civata giştî ya partiyên siyasî yên di vî rengî de, dibe armanc û ji bo serkewtinê bi ser hevrikan de, rêyên nedemokratîk jî tên ceribandin.

Di wir de navenda birêveberiya heyî, hewil dide bi kontirolkirina dezgeh û navendên sereke yên saziya xw û asteng kirina rêya hevrikên xwe bo serkewtinê di hilbijartinên hindûr de asteng bike û pitir di rêya guhertina sîstem û yasayên hilbijartinê de ku esla sereke ye di hilsengandina demokrasiyê de hewil dide.

Di heman demê de jî hevrikên din di terzê destek û girûpan cuda de di bin siya demokrasiyê de hewil didin bo dûrxistina raya giştî ji navenda birêveberiya berê.

Lewma girîngîdan û xwe girêdan bi hilbijartinê bo gihîştin bi navenda biriyardanê, cihê kar û xebatê di pêxema pêsdebirina pêvajoya azadîxwaziyê û gihîştin bi armancan digire û berhema vê çendê jî tenê zivirîn di bazneyeke bê berhem a tengav û tengavtir deye.

# Divê ne ji bo mijûl kirinê, ji bo çareserîyeke rasteqîn gavên pêwîst bêne avêtin û hemû alîyên kurdan mixetab bêne girtin!



N. Mustafa Ozçelîk,
Serokê giştî yê "PWK "



Daxuyanî û gotinên Serokê MHPyê Devlet Bahçelî nîşana wê yekê ye ku di metbaxa Dewleta Tirkîyeyê de xwarinek tê kelandin; lê nuha ne dîyar e ku ka ev xwarin çî ye? Devlet Bahçelî, heta meheke berê jî digot ''Divê DEM partî bê daxistin û Ocalan bê îdam kirin''; lê nuha dibêje ''Bila Ocalan were Parlamentoya Tirkîyeyê û biaxive'' ev cîhê balê ye û nîşana planeke nû ye.

Herweha dîyar e ku ev plan ne bes ya Devlet Bahçelî tenê ye; ev plan, plana hevbeş a Serokkomarê Tirkîyeyê Recep Tayyîp Erdogan, Devlet Bahçelî û rayedarên Dewleta Tirkîyeyê ye. Lê belê, pir zelale ku di gotinên Devlet Bahçelî de ji bo mafên neteweyî, demokratîk yên miletê Kurd tu tiştuneye. Devlet Bahçelî behsa ''pêvajoyeke çareserîyê ya nû'' jî nake, bes dibêje ''Bila Ocalan bangî PKKyê bike da ku çekan deynin û bila PKK bê fesh kirin'' û behsa sist kirina tecrîda li ser Ocalanî û guhertina Yasaya Înfazê tê kirin.

Dîyare ku Dewleta Tirkîyeyê piştî rûdanên vê dawîyê yên li Rojhilata Navîn, ketîye nav tirsek û xofeke ku dikare ev rûdanan tesîreke neyênî li wê bike. Dewleta Tirkîyeyê, ji xwe di nav qeyraneke mezin ya aborî, siyasî, civakî û dîplomatîk de ye; van rûdanên li Rojhilatê Navîn dê vê qeyranê kûrtir bike û dikare bibin sebebê guhertinên mezin jî.

Dewleta Tirkîyeyê ji wê yekê ditirse ku rûdanên nuha yên li Rojhilata Navîn dikare rê li wê yekê veke ku li Başûrê Kurdistanê destkeftinên federe pêşdetir biçin û bigihêje asteke din; li Rojavayê Kurdistanê rewşa fiîlî bi tifaqa hêzên kurdan ber bi destkeftineke giştî ya kurdên Rojavayê Kurdistanê ve here; li Rojhilatê Kurdistanê bi lawazbûna Dewleta Îranê, gelê me yê Rojhilatê Kurdistanê dikare hinek destkeftinên milî, demokratîk, statüyeke sîyasî bidest bixe. Ew bûyer û pêşketin, bivênevê dê tesîrek mezin li Bakurê Kurdistanê jî bike.

Ji ber vê rastîyê û vê tirsê, Dewleta Tirkîyeyê nuha wek ku xwe ji îhtîmala bahozekê biparêze, dixwaze hinek tedbîran werbigre; ew dixwaze hem rê li ber destkeftinên hersê perçeyên din ên Kurdistanê bigre, hem jî nehêle ew pêla bahoz û tsûnamîyê bigihêje Bakurê Kurdistanê ku kurd maf û azadîyên xwe yên neteweyî, demokratîk bidest bixin.

Sîyaset û helwestên AK Partî, MHP û bi giştî Dewleta Tirkîyeyê yên heta îro li ber çavan e; lê emê piştgirîyê bidin her gavekê ku şer û operasyonên leşkerî yên Dewleta Tirkîyeyê û çalakîyên çekdarî yên PKKyê rawestinîn û rêya çareserîya sivîl, demokratîk û sîyasî vekin. Lê ne rast e ku mesele bes bi ''Mafê Umîdê'', yan jî bi rewşa Ocalan ve bê sinûr kirin.

Pirs, ne pirsa şexsekî yan partîyekê ye, ne jî tenê pirsa rawestandina şerî ye. Pirs, pirsa mafên neteweyî, demokratîk ên miletê Kurd e; pirsa kurd û Kurdistanê ye.

Lê belê helbete ku çareserîya vê pirsê dikare ji cîhekî bê destpê kirin. Ji ber vê rastîyê jî em bangî Dewleta Tirkiyeyê dikin da ku van tecrubeyên xwe yên 100 salî bidin ber çavan û li cîhê planên ku dê pirsgirêkan dijwartir û kûrtir bikin û ji hişmendîyeke mijûlkirinê dûr, gavên rasteqîn û maqûl ên ku dê rêya çareserîyê vekin bavêjin.

Em dibêjin ji bo rê li çareserîyeke sivîl, sîyasî, demokratîk bê vekirin, divê weke destpêk ev gav bêne avêtin:
- Divê rêz li maf û azadîyên hemû kesên ku di hevsê de ne bê girtin û dîvê hemû kesên ku ji ber fikirên xwe û ji ber xebatên xwe yên sîyasî ceza xwarine û di hevsê de ne, bêne azad kirin. Ji bo vê armancê jî divê guhertinên yasayî bêne kirin.

- Divê Dewleta Tirkîyeyê hemû operasyonen xwe yên eskerî û şerê heyî rawestîne, dest ji girtin û neheqîyan berde; herweha divê PKK jî dawî li hemû çalakîyên xwe yên çekdarî yên li Bakur û Başûrê Kurdistanê bîne.
- Divê Dewleta Tirkîyeyê hemû partîyên kurdan, dezgehên sivîl ên li Kurdistanê û kesayetên qebûlbar yên civakî, ji bo guftûgo kirin û çareserîya pirsgirêkan mixetab bigre.

- Divê nasnameya kurdî, perwerdeya bi zimanê kurdî û fermîbûna zimanê kurdî û azadîya ramanî û rêxistinî bêne qebûl kirin û di Qanûna Bingehîn ya Tirkîyeyê de bêne garantî kirin.
- Divê qedexeyên li ser navê Kurdistanê rabin û Qanûna Bingehîn û hemû yasayên Dewleta Tirkîyeyê li gorî peymanên navneteweyî yên ku Dewleta Tirkîyeyê îmze kirin ji nû ve bêne nivîsandin û qebûl kirin.

Ji bo ku ev pêvajo bi rastî jî bibe destpêka çareserîyeke sîyasî, demokratîk helbete ku divê em ji her dîyalog, guftûgoya li gel Dewleta Tirkîyeyê, li gel partîyên desthilat û mixalefetê re vekirîn. Lê, divê hemû partîyên kurdan, dezgehên sivîl ên li Kurdistanê û kesayetên qebûlbar yên civakî bizanibin heger ku em çareserîya meseleya xwe bes hewaleyî însîyatîfa Dewleta Tirkîyeyê, AK Partî, MHP, CHP û partîyên din bikin û em bes li hêvîya wan bihêlin, dîrokê îspat kirîye ku dê tu encam jê dernekeve û dê rewş xerabtir bibe.

Ji ber wê jî divê wek destpêk, li ser bernameyeke ku ji daxwazên acil ên miletê Kurd pêk hatîye, berîya her tiştî divê em hemû partîyên kurdan, dezgehên sivîl ên li Kurdistanê û kesayetên qebûlbar yên civakî hêza xwe bikin yek û bi van daxwazên ku me li jorê destnîşan kirine bibin mixatabê Dewleta Tirkîyeyê. Heger em bi hêza gelê xwe, yekgirtî bin û em li himberî hinek xapandin û lîstokan hişyar bin, emê bikaribin rêya serkeftinê baştir û xurtir bikin, emê bikaribin wek nûnerên gelê xwe bibin mixatabê çareserîyê.

Ji bo vê yekê jî nabe ku bes kesek an alîyek tenê bibin mixatabê vê meseleyê û mesele ji rastî û zemîna çareserîya maf û azadîyên milî, demokratîk yên miletê Kurd bê dûr xistin. Herweha, divê em wek alîyê kurdan, li gel hemû alîyên ku piştgirîya mafên neteweyî, demokratîk ên miletê Kurd dikin; azadîyê, aşitîyê û demokrasîyê diparêzin re di nav dîyalog û hevxebatê de bin.

## Nerîna



**"Gulistan Kiliç Koçyîgîtê":**

**"Qeyûm ne tenê çavkaniyên gel tune dike, di heman demê de ziman, çand û jiyana herêmê jî tune dike"**



**"Fuad Husên":**

**"Rewşa siyasî û ewlehî ya Rojhilata Navîn dê bandorê li Iraqê bike"**



**"Donald Trump" :**

**" Demokratan Amerîka xistiye nav krîzê"**



**"Hakan Fidan":**

**"Esed û hevalbendên wî amade ne bi muxalefetê re li hev bikin û rê bidin ku rewşeke asayî pêk were"**

# Îran bûye rojeva navçeyê, Almanya karvedan nîşan da!



**N. Eskender Ceiferî**



Îran di darvekirina welatiyên biyanî de bi tometên siyasî berdewam e û ev jî di asta cîhanê de karvedanê li pey xwe ve tîne.

Piştî ku welatiyekî Îranî û Almanî bi navê Cemşîd Şarmehd bi tometên siyasî li Îranê hate darvekirin, pêwendiyên navbera Îran û Almanya aloztir bûn.

Almanya çendîn caran ji rêjîma Îranê xwastibû ku li biryara darvekirina wî vegere lê belê Îranê ew darve kir.

Piştî darvekirina wî, Almanya kunsûlxaneyên rêjîma Îranê li bajarên Hamburg, München û Frankfurtê girtin.

Tevî ku çalakvan dibêbin pêwîst e sifareta rêjîmê li Bêrlînê jî bê girtin, lê dîsa jî ev weke destpêk baş e.

Rêjîma Tehranê di binpêkariyên mafên serhildêran de jî berdewam e û di asta navdewletî de jî karvedanên zêdetir çê dibin.

Rêjîm herwisa givaşê dike ser kompaniyên Înternetê jî da ku zanyariyên welatiyan û serhildêran bidin rêjîmê.

Çapemeniya Îranê ragihand ku derfeta ku rayedarên Tehranê dabûn Mêta ji bo girtina Instagram û WhatsAppê bi dawî bûye.

Li gorî berpirsên Îranê, eger ew kompanî bersiva daxwazên Îranê nede, Instagram û WhatsApp dê li Îranê bi awayekî hertimî bêne girtin.

Navenda Înterneta Netewî ya rêjîma Îranê du name li ser vê mijarê ji Mêta re şandine.

Serokatiya vê navenda rêjîmê gotiye, heke Mêta bersivê nede, dadweriya Îranê dê platformên wan ji bo hertim bigire.

Herwiha diyar kir ku ji bo berdewamkirina van platforman lîsansa yasayî hewce dike.

Berê jî Wezareta Navxwe ya rêjîma Îranê gotibû ew hewl didin da ku cîhana hîpotetîk ji bo hertim rawestînin.

Di van salên dawî de, rêjîma Îranê çend torên civakî ji wan Facebook û Twitter fîltêr kirine û tometbarê destêwerdan di serhildana wî welatî de kirine.

Tê gotin hewlên rêjîmê ji bo astengkirina Internetê, tenê ji bo bidawîanîna serhildanê ne.

Tevî wê, rêjîma Tehranê hewl dide navçeyê aloz bike da ku bala cîhanê li ser serhildanê nemîne.

### Emmanuel Macron serokkomarê Fransayê bi awayekî rasterast, Îran bi derxistina aloziyê li Îraq, Yemen, Filistîn, Lubnan û Israîlê tometbar kir.

Wezîrê Derve yê rêjîma Îranê jî heman tomet arasteyî serokkomarê Fransayê kir û bi awayekî nerasterast bersiva hevdû dan.

Emmanuel Macron herwisa di axaftina xwe de parastina serweriya Îraqê dupat kir û daxwaza bidawîanîna destêwerdana karûbarên navxweyî yên Îraqê kir.

Berpirsên Îranî jî di konferansê de li hember axaftinên serokkomarê Fransayê diyar kirin: "Nabe li axa welatên me yên dost û bira, gef li tî welatekî were xwarin, em di wê baweriyê de ne ku kêşeyên navçeyê tenê bi rêya gotûbêja navbera welatan têne çareserkirin,Ev jî di demekê de ye ku Îran bixwe li navçeyê piştevaniya têror û aloziyan dike.

Wezîrê Derve yê Îranê li ser parastina asayîş û serweriya Îraqê got: "Mijara asayîşê bi hemû welatan ve girêdayî ye, nabe hemû hewldan ji bo neseqamgîrkirina welatekî were dayîn û li aliyê din hewl ji bo seqamgîriya welatekî din were dayîn."

Rêjîma Tehranê ne tenê li vir, lê di mijara Ukraynê de jî hîn her rojev e.

### Serokwezîriya Brîtanya ragihand ku divê Îran şandina çekan ji Rûsiyê re rawestîne.

Di daxuyaniya Brîtanya de hatiye ku ewê doza alîkariya leşkerî ya Îranê bigihînin Neteweyên Yekbûyî û rê li hinartina balafirên bêpîlot û çekên Îranê ji bo Rûsiyê bigirin.

Rast e ku Îran dixwaze bala kesî li ser serhildanê nemîne, lê Yekîtiya Ewropayê û Îsraîl her yek ji rexekî ve mijûl in da ku gefên rêjîma Îranê ji bo ser navçeyê kontrol bikin.

# Xuyaye ev hevîr wê gellek av bigire…



N. Cano AMEDÎ



Serokkomarê Tirkîye Erdoğan li Rusya/ KAZANê bi PUTÎN re hevdînenên endametîya Tirkîye ya BRICSê dike. NATO û BRICS dijberê hevin…weke stratejîk ji endametîya dewletek bi her dû alîyan re ne mumkin e! Gelo wê, ev zevaca bi herdû alîyan re çiqas mumkin be, wê dem nîşan bide.

Di heman demê de li Enqerê navça KAZANê (Kahraman KAZAN) êrîşek çekdarî li hemberî TUSAŞê pêk hat… Êrîşek stratejîk, êrîşek bi peyam û êrîşek girîng…

Di video û dîmenên cîhê êrîşê de wêneyên êrîşkaran xuya dike, li cihêkî du kes xuya dikin, di weneyekî de sê kes xuya dikin, di wêneyekî de kesek xuya dike.

Hinek çavkanîyên çapamenî yê qala 5 êrîşkaran dikin û dibejin hejmara mirî û birîndaran zêdeye…

Hemû Nexweşxaneyên Enqera di asta herî bilind xistine teyaqûzê/ an alarmê…

Di siyaset û ticaretê de pirî caran bi Tirkî qala formula ” Birlikte KAZAN KAZAN”ê dikin.

( Bi hevre qezenç qezenç kirin) Gelo ev civîna li KAZANa Rusya û têqîna li KAZANa Enqara çi peyaman dide? Dem û pêvajo tesadufî ye an jî amedekarîya listokek nû ye?

Pirs pirsan tîne, nirxand û şiroveyên cuda rê li bersivan vedike.

Gelo ew grûbên çekdar yên girêdayî Tirkiyê, li Libya, Surî û Rojava tevdigerin, têkilîyên wan bi Sadatê re çi ye?

Kî li ser navê kê îhalan digire? Kî li ser navê kê çekan bi kar tîne? Şerê wekalet, grubên mîsyoner û nakokiyên di nav baskên dewletê rê li ber pirsan vedike…

Ji bîr nekin di demên qeyran û alozîyan de alîyên dijber ji bo destê xwe bilind bikin carnan hamleyên xeterdar dikin.

Ji ber wê yekê dive em pêvajoyê bi aqlê selim bişopînin û li gorî berjewedîyên milletê Kurdistanê tevbigerin.

Pêvajoyên dîl girtinê, dorpeçkirina destkeftiyên milletê kurd; şerê Îran û Îsraîlê, Projeyên dîzayn kirina heremê bi serê xwe cihê nîqaşê û şiroveyên cuda ye.

Dewleta terorîst Îran li heremê desthilatdarê û dixwaze pêlên êrîşên ser xwe sivik bike, an jî wan êrîşan li dervayê sînorê bigre.

Ji ber wê yekê aparat û alîyên girêdayî xwe dikare di demên kinde mobîlîze bike.

Di derbarê dijminatiya milletê kurd e, dewleta Tirk û ya Îranê mutefikin/ şirîkin, lê di qadên din du dewletên dijberê hevin. Ji ber wê yekê herdem destê wan di berîka hevda ye…

Li Tirkîye siyaset li ser teoriyên komloyan tê meşandin.

Lê divê em kodên avakirina dewleta TIRK û plansaziya “Sê tarzê siyasetê” baş bizanibin û felsefa Îttîhad Terakkî jî tu carî ji bîr nekin.

Ji bîr nekin hemû nakokî û pirsgirêkên nav wan, gava mijar dibe Kurd û Kurdistan hemû dibin yek.

Bila kes xewna nebîne û xwe ne xapîne, bapîrên me bîla sev negotine: Bextê Romê tune ye…

Ev sed sale, dewleta Tirk bi sîyaseta xapînok li gorî berjewedîyên xwe, demsalên “hêvî” yê bi nav dike, lê di heman deman de demsalên dijwar, demsalên dîl girtinê li ser civatê di ceribîne.

Fînalên wan pêvajoyan her tim komkujî û provakasyonên mezin bûye. Mînaka her dawî Şerê Xendekan e. Divê em ji tecrubeyên borî dersan vebigirin û li gorî berjewedîyên netewî tevbigerin.

Divê em baş bizanibin problema, problema mafên milletbûnê ye.





# Feydeya nivîsandinê çi ye?



N. Vênûs Faqyîq
W. Hesen Mukerem



Çima em dinivîsin? Nivîsandin çawa dikare vê rastiya trajîk ku tê de jin berdêlên giran didin biguhere, di demekê de ku zordariya olî bi zordariya siyasî re têkel e?

Ez di vê baweriyê de me ku tiştên ku em dinivîsin bikêrhatî be yan na, em dîsa jî dinivîsin, wekî nivîskarê ku navê wî nayê bîra min dibêje: Ez dinivîsim da ku tiştekî xweş li dû xwe bihêlim.

Hin ji bo jiyana xwe bidomînin, hin ji bo li dijî zilmê têkoşînl bikin dinivîsin.

Lê bi saya vê rastiya trajîk, nivîsandin dibe şerm, zulm û bêdesthilatiyê.

Ev yek bi qasî ku bi xwendevan û wergiran ve girêdayî ye bi nivîskar re tine ye, ji ber ku dema civak roj bi roj şopên xwe yên çandî yên kolektîf winda bike, tu pirsgirêk nabe pirsgirêka raya giştî û ewqas pênaçe kip dibe.

**Jinavbirina rewşenbîrî û îdeolojîk dibe mohreke serdemê û nivîsîn dibe kiryarek tenê bo xwe betalkirinê, nivîskar û çalakvanên li ser torên civakî ti cudahiyeke wisa ya wan tuna be.**

Kanê ev nivîsa ku pirsa jin û êş û azarên wê di bûyerekê de kiriye mijareke pir giran a raya micid ku her kes bi hev re bifikire û bi yek helwestê îfade bike?

Em di rastiyekê de ne ku ol ketiye nav hûrgiliyên herî xweş ên jiyana me, nemaze dema ku ew bibe prensîbek ferzkirî ji bo rêveberiya dewletê, û jin qurbaniyên yekem in.

**Hemî nivîsandin dê bêkêr be heya ku em ji xwe nepirsin: Çima em dinivîsin dema ku li dora me ji her demê zêdetir mirin û ji her demê zêdetir pirsgirêk û êşên mirovahiyê hene?**

Li asta ya ku hemû tiştên di civaka me de tên serê jinan, nivîsandin tu hêza xwe ya kêmkirina perîşaniya wan nîne ku bikarî pê piştgerm bî.

Mînaka wan tawanên ku li dijî jinên Êzidî hatine kirin, ez gihandime wê baweriyê ku nivîsandin cihekî din e û hizra kujerên jinan li cihekî din e.

Dema ku jin wek 1400 salan berê li sûka Mûsilê ku dişibihe bazara Akazê dibirin û difrotin, ji bo nivîsînê çi wateyê dimîn e?

Nivîsandin wê demê û niha tu rol nelîst.

**Jin her roj rastî êrîşan tên, tên şermezarkirin, tên kuştin, bi darê zorê tên zewicandin û bi zorê jiyaneke dijwar li ser hişmendiya mirovan çêdibe, bi awayekî ku rûmeta jinê qerebû bike?**

Dema ku nivîsandin tenê ji bo nivîsandinê be, nivîskar derdikeve eniyeke li dijî ol û baweriyê û hemû hêviyên guhertin, pêşketin û demokrasiyê dibin vehim û xew.

Em bi vê rastiyê re rû bi rû ne, pirsa "feydeya nivîsandinê çi ye?" dikin. ku bi rastî ne pirsek nû ye.

Belkû, digel bilindbûna krîzan, pirs mezintir dibe:

Di rastiyê de divê em bipirsin: Di vê serdema tinekirina exlaqî û têkçûna wijdanê de ji nivîsandinê çi tê bikaranîn?

Nivîsandin dê kengî hêza xwe ya rastîn wekî berê bi dest bixe?



# Hunera wergerê, Wergêrên jêhatî û Berhemên Wergera Baş (Beş 2)



**N. Rojan Sofîzade**
**W. Hesen Mukerem**



- Di wergereke baş de nermalava wergerê û hişê destkird nayên bikaranîn.
Her weha, wekî ku min berê jî behs kir.

Wek min berê jî behs kiribû, nermalava wergerê wek Google Translate nivîs bi peyv werdigerîne, ku peyamê nagihîne û naveroka zimanê çavkaniyê berovajî dike.

Ev nermalava hanê ji bo wergerê îstîxbarata çêkirî bikar tînin, di vê rewşê de naveroka nivîsê ne girîng e û dibe ku peyva çavkaniyê bi peyvek ku ne wateya peyva çavkaniyê ye were guhertin.

Dibe ku xuya bibe ku ev nermalava wergerên baş pêşkêş dikin, lê bi lêkolîna metna wergerandinê ji hêla pisporek an xwendevanek baş ve, hêsan e ku were destnîşankirin ku werger ji hêla nermalavê ve hatî çêkirin û gumanê çêdike ku naveroka nivîsa çavkanî di nav de nayê hesibandin. peyvên.

Ne jî wergêrek baş vê rêbazê bikar tîne. Lêbelê, divê ez jî destnîşan bikim ku ji bo dîtina xeletiyên rastnivîsê, karanîna îstîxbarata çêkirî dikare pir alîkar be.

Taybetmendiyên wergerekî baş:
Gelek kes di wê baweriyê de ne ku bi fêrbûna zimanên biyanî, ew ê bibin wergêrên pispor û pispor û karibin gelek nivîsan wergerînin. Lê belê ev bawerî bi tevahî şaş e, ji ber ku werger karekî pîşeyî ye û tenê pispor û pisporên xwedî tecrubeya gelek salan di vî warî de dikarin hûrgiliyan li ber çavan bigirin û metneke wergerî ya baş derxînin.

Lê bi giştî divê wergerek xwedî kîjan taybetmendiyan be ku wergerekî baş an wergêrekî pispor were naskirin? Wergêrê pispor ew e ku bi karanîna jêhatîbûn û amûrên ku li ber destên wî hene, bikaribe peyv û hevokên rast hilbijêre da ku di nivîsa xwe ya werger de baştirîn girêdan di navbera hevokên xwe de çêbike.

Wergêrek pispor dikare bi karanîna ezmûna ku di wergera pispor a nivîsarên cihêreng de bi dest xistiye, şablona zimanê nivîsa werger bi parêze. Wergêrên herî jêhatî mirovên xwende ne. Bo nimûne, kesê xwenda û zanîngeh qedandiye di warê xwe yê xwendinê de wek wergêr kar dike, xwediyê zanyariyên akademîk ên guncaw e û peyvên taybet bi warê xwendinê dizane û bikar tîne.

- Di vê beşê de, ez ê bi kurtî behsa hin taybetmendiyên wergêrek jêhatî bikim:

- Wergêrekî baş xwedî zanîneke baş li ser zimanê çavkanî û mebestê ye.
Taybetmendiya yekem a wergerekî baş zanîna zimanên çavkanî û armanc e; Wergêrekî baş divê bikaribe nivîsê ji zimanê çavkanî wergerîne zimanê mebest. Ango divê wergêr bi temamî bi zimanên çavkanî û armancê bizane û ji rêziman, rastnivîsîn, ferheng, termînolojî û çanda herdu zimanan haydar be.
Zanîna serçav û zimanê mebest ji wergêr re dibe alîkar ku wate û peyama nivîskar rast fêm bike û bigihîne. Naskirina termînolojî û çanda her du zimanan ji wergêr re dibe alîkar ku metnê li gorî mebesta xwe biguncîne û ji hilbijartina hevwateyên neguncayî an berevajî ruhê ziman dûr bixe.
Ji bo zêdekirina jêhatîbûn û naskirina zimanên çavkanî û mebest, werger divê rêbazên curbecur wek "lêkolîn, lêkolîn, pratîk û ezmûn" bikar bîne.

- Wergêrekî baş bi warê pisporî yê nivîsê dizane.

- Yek ji girîngtirîn taybetmendiyên wergêrekî baş zanîn û pisporiya di warê pisporiya nivîsa ku werdigerîne de ye. Divê wergêrek baş bikaribe nivîsên pispor li gorî mijar û naveroka wan wergerîne. Ji bo vê jî divê werger di warê taybetiyên metna ku werdigerîne de xwediyê zanyariyên pêwîst be û ji bo lêkolînê çavkaniyên pêbawer û rojane bikar bîne.

- Nasbûna bi mijar û warê pisporî yê metnê ji wergêr re dibe alîkar ku têgeh, têgeh, nîşan û hêmanên din ên nivîsê rast fêm bike û wergerîne û nahêle ku hevwateyên nerast û neguncayî hilbijêrin.

- Wergêrekî baş yekparebûna nivîsê diparêze.

- Divê wergêrekî baş, nivîsê bi awayekî balkêş, herikbar û bi bandor pêşkêşî xwendevanên zimanê armanc bike. Wergera xwerû tê wê maneyê ku wergêr strukturên zimanî yên guncaw, ferhengokên rast, termên hevpar, û qaîdeyên nivîsandinê dişopîne, xwe ji wergerên "peyv-bi-peyv" dûr dixe, naverok zêdekirin an jêkirin, û yekitiya metnê diparêze.

- Wergêrekî baş di wergerê de bi durustî û bêalî kar dike.
Yek ji girîngtirîn taybetiyên wergêrekî pispor "pêbawerî" û "bêalîbûn" e. Ev taybetmendî nîşana rêzgirtin û wefadariya nivîskar û xwendevanê metnê ye. Divê wergêrekî baş karibe wate û mesaja nivîskar bi zimanê mebestê ragihîne, bêyî ku naveroka metnê lê zêde bike, kêm bike û biguherîne.

Dirustbûn û bêalîbûn di gihandina peyama nivîskar de, ji wergêr re dibe alîkar ku ji xeletiyên semantîk, çandî, bîrdozî û siyasî dûr bisekine û nivîsê rast û zelal wergerîne. Ev ji xwendevan re dibe alîkar ku bi nivîskar û mijara nivîsê re têkildar be.

**netîce:**
Di vê gotarê de, me li ser hin taybetmendiyên ku wergêrek baş divê hebin, şêwir kir. Taybetmendiyên wergêr tenê bi kapasîteya wî ya wergerê ve girêdayî ne; Wergerekî baş divê di karê xwe de bi sebir, afirîner, bi xîret û baldar be. Berevajî baweriya gelêrî, werger karekî dijwar e ku pêdivî bi baldariya zêde heye.

Ger hûn nikaribin demek dirêj bala xwe bidin wergerandin an jî hûn hez nekin li ferhengên cihê bigere da ku wateyên cûda û karanîna peyvan bibînin, hûn ê nikaribin bibin wergêrek profesyonel.

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Jîna Moderis bo girtîgeha rêjîmê li bajarê Sinê hate veguhastin



Jîna Moderis a rojnamevan û çalakvana mafê jinan ku pêştir ji aliyê dadgeha rêjîmê ve 16 heyv binçavkirin bi ser de hatibû sepandin, bo girtîgeha rêjîmê li bajarê Sinê hate veguhastin.

Roja Şemî 12ê Xerzewerê, Jîna Moderis a rojnamevan û çalakvana mafê jinan ku pêştir ji aliyê dadgeha rêjîmê li bajarê Sinê de 16 heyv hewskirin bi ser de hatibû sepandin, bo girtîgeha navendî ya rêjîmê li bajarê Sinê, hate veguhastin.

"Jîna Moderis", berî çon bo girtîgehê li tora civakiya "Instagram"ê de peyameke wiha belav kir: "Îro ez diçim nav girtîgehekê ku bidûrragirin û cudatîdanîn li wir, 3 beranber e, ew girtêgeha jinan li bajarê Sinê ye, bidûrragirtin û cudatîdanîna zayendî, çînayetî û netewayetî ye, li halekê de ku min tiştên xwe bo çon bo girtîgehê amade dikir, berî hemû tiştekê min hiviya xwe xiste nav çantê xwe, ez bi hiviyê ve diçim wir.

Ew rojnamevan û çalakvana mafê jinan, li 1ê Xezelwerê de ji aliyê taya 4 a dedgeha birêvebirina sizayên sepandî ya rêjîmê li bajarê Sinê, hatibû agehdarkirin ku divê li 12ê Xezelwerê, bo cîbicîkirina vê sizayê xwe bide nasandin.

## Rêjîma Îranê zêdetir ji 8 kes bidar vekirin



Rêjîma Îranê li girtîgeha Qizilhisar û navendî ya rêjîmê li bajarê Kerecê, 8 kes bidar vekirin ku pêştir bi tohmetên pêywendîdar bi madên hişber an kuştina bi zanebûn sizayê bidarvekirinê bi ser wan de hatibû sepandin.

Sibêdeha roja Çarşemî 9ê Xezelwerê, 4 girtiyên bi navên "Muhsin Rastgû", Mihemed Celalî yê xelkê bajarê Kirmaşanê û "Saman Enberî" û "Mistefa Xulamzadê" yê xelkê bajarê Yezdê ku pêştir bi tohmetên bi tohmetên pêywendîdar bi madên hişber û kuştina bi zanebûn sizaya bidarvekirinê bi ser wan de hatibû sepandin li girtîgeha Qizilhisar a rêjîmê li bajarê Kerecê de hatine bidarvekirin.

Herwisa sibêdeha roja Sêşemî 8ê Xezelwerê, 3 girtiyên bi navên "Mihemed Nidayî, Elîekber Exayêr û Ekber Xuremtac" ku bi tohmetên pêywendîdar bi madên hişber sizaya bidarvekirinê bi ser wan de hatibû sepandin, li girtîgeha navendî ya rêjîmê li bajarê Kerecê de hatine bidarvekirin.

Herwisa li vê rojê de girtiyekî xelkê devera "Balawend" a bajarê Kirmaşanê yê bi navê "Murwetelî Keremî" li girtîgeha navendî ya rêjîmê li bajarê Kerecê da hate bidarvekirin.

## Rêjîma Îranê kesekî 2 nasnameyî yê Îranî-Almanî li girtêgeha xwe de bidar vekir



Rêjîma Îranê kesekî xwediyê nasnameya Îranî-Almanî ku li sala 1399 li bajarê Dobêyê de hatibû revandin, bi tohmeta "mufsidê fîl erz" sizayê bidarvekirinê bi ser de sepandibû û li 7ê Xezelwerê de bidar vekir.

Li sibêdeha roja Duşemî 7ê Xezelwerê, rêjîma Îranê kesek ê bi navê "Cemşîd Şarmehd" ê temen 67 salî ku nasnameya Îranî-Almanî heye û heyamekê jî rûniştiyê Amerîkayê bûye û li 11ê Gelawêja sala1399 a rojî, li bajarê Dobêyê de ji aliyê hêzên îtilaat a rêjîma Îranê ve hatibû revandin û bi tohmeta "mufsidê fîl erz" sizaya bidarvekirinê bi ser de hatibû sepandin, bidar vekir "Cemşîn Şarmehd" li girtîgehên îtilaata rêjîmê de rastî îşkenckirinên hovane hatibû û neçar bi îtirafa bi zorê hate kirin û li rewşeke herî dijwar a tendirustiyê bê dermanên hewce, heyamê 720 rojan li odeya takekesî de mabû û hemû didanên devê wî jî li dema îşkencekirinê de hatibûne şikandin.

Rêjîma Îranê bi zorê, tohmeta darîştina bername bo encamdana teqîn li husêyniyeya bajarê Şîrazê de bi ser desepandibû.

# Agirî

- Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (481)

